StEPS
Statewide Eyesight Preschooler Screening

SHPN (HSP) 200138

# StEPS

## Fehsa çavê bo zarokên pêşdibistanê li seranserê welêt

Statewide Eyesight Preschooler Screening



Tu çi divê li ser bernameya StEPS bizanin

NSW GOVERNMENT

Kurdish

## StEPS çi ye?

Bernameya StEPS destpêşxeriya Tenduristiya NSW NSW Health ye û fehsa qaweta çavdîtinê zarokên 4 salî belaş pêşkêş dike.

## Ma çima dê hewceyê ku çava zarokê min were fehis kirin?

- Zarok kêm ji pirsgirêkên çav re gilî dikin
- Zarok belku nikarin fêm bikin ku ew baş nabînin
- Hin zarok dikarin bi yek çavê baş bibînin lê di çavê din de nêrînek pir kêm heye
- Dibe ku çavên zarokan baş xuya bibe û dêûbav / nêrevan dikarin difikirin ku za-rokê wan baş dibîne lê dibe ku hin za-rok hîn jî pirsgirêka dîtinê hebin
- Awayê tenê ku hûn bibêjin ka zarok pirsgirêkek dîtinê heye ev e ku yek çavê zarok di yek dem bê çêkandin.



## We zanibû?

- Heke zarok `çavsistî` hebe, dibe ku bibe sedema windabûna dîtina çavan an jî kor bibe eger neyê derman kirin
- Ger zarokek pirsgirêka dîtin heye, ew pirsgirêka zûtir bête kişfkirin û dermankirin encamê dîtin çêtir dibe
- Heke dêûbav berçavk bikin çav an di zarotî wan de pirsgirêkên dîtinê hebe, zarokên wan jî dibe ku pirsgirêkên dîtinê hebin
- Piştî temenekî taybetî , hin pirsgirêkên dîtina zaroktiyê nikarin bêne derman-kirin û zarok dê heya dawiya jiyana xwe kêmdîtinê dibe - berçavk dê ne arîkar bibin
- Zarokên ji dayikbûyî kêmwezin û ba pirsgirêkên neurolojîk pitir li bin rîska peydabûna pirsgirêkên çavan in.

## Ma pêdivî ye ku fehsa çavê zarokê min bikin?

Tenduristî ya NSW NSW Health ji hemî zarokan re şîret dike ku fehsa çavê wan were girtin berî ku ew dest bi dibistanê bikin û bi tundî pêşniyar dikin ku hemî zarokên 4 salî di bernameya fehsa çavê de beşdar bibin

## Çawa zarokê min dikare bigihîje ber-nameya StEPS?

Navçeya Tenduristiya Herêmî ya we Lo-cal Health District dê pêşdibistan û na-vendên lênêrîna zarokan bike armanc ku ji bo zarokên çar salî fehsa çavê belaş pêşkêşî bike. Ji bo ku fehsa çavê za-rokê we were çêkirin, divê hûn formek razîbûnê dagirin û ew vegerînin naven-da pêşdibistanê / lênihêrîna zarokan.

Her weha hûn dikarin bi saya Xizmeta Tenduristiya Zarok û Malbatê devera xwe ve Child & Family Health Service fehsa çavê zarokekî çar salî ya we bikin. Agahî têkiliyê gel Xizmeta Tenduristiya Zarok û Malbatê Child & Family Health Service devera we li ser pişta vê belavokê heye.



## Ez ê çawa zanibim ku zaroka min pirsgirêka dîtina heye?

Her dêûbav / nêrevan ku fehsa çavê za-rokên wxe kirine, dê ji encamên nirxan-dina dîtinê ya zarokê / a xwe agahdar bibin. Ger pirsgirêkek dîtina were tespît kirin hûn ê bi Local Health District-Navçeya Tenduristiya Devera xwe re dê werin têkilî kirin û tê xwestin ku çavên zarokê we bi tevahî ji hêla pisporê ten-duristiya çavan ve were çêkandin.

Ev girîng e piştrast bikin dîtina her zarok normal pêşve diçe li dema zaroktiya.

Bernameya StEPS bernameke bo fehsa çavê ye û nirxandina tespîta bêkêmasî pêşkêş nake. Heke di derbarê çavê za-rokê we de fikarên we hene, tê pêşni-yarkirin ku çavê zarokê xwe bi tevahî ji hêla pisporê tenduristiya çav ve were çêkandin.